Eger encumena tê xwestin bi vê şêweyî be, Partî amade ye ku bi hemî hêz û şiyanên xwe ve xebat bike di rêgeha damezrandina vî encumenî de.

7- Di warê Geşkirina wêje, çand, folklor û zimanê kurdî de, partiya we îro çi karî dike?

Di warê Folklor de, Partî jimarek ji koman damizrandiye, komên Partî xwedan astekî hunerî bilind in ta radiyekî baş.

di warê fêrkirina zimanê Kurdî de , çend bizavên kêmtir ji viyana me hatine pêk anîn, lê di warê wêje û çanda Kurdî de, mixabin . Ku ji bili arîkariyên diwarê çapkirin û firoştina berhemên nivîskaran tu bizavên dî tune ne, û em hêvîdar in ku em vê kêmasiyê di demekî kurt de çareser bikin.

8- Eve 66 hejmar in ji weşana Newroz a du mehane bi temenê 10 salan belav bûne. Hun derçûna vê belavokê çawa dibînin, çi rexne û kêmaniyan lê digrin mamoste?.

Biborin dema qusurekî we aşkira bikim , hevalên hêja, ku ez bêjim ev hejmara 66 an ku cenabên we bo min perû kir , hejmara yekemîne ku dighe min, û ez omîdewarim ku ne ya dawî be, her hal ez dikarim bêjim : destên we xweş bin, asta weşana we bilind e.

9- bêgomane ku zimanê me, nasnama me ya netewî ye. Ji bo fêrbûn û fêrkirina zimanê dayika me, hûn ji keç û lawên gelê xwe re çi dibêjin?.

Ev pirsa han bersiva xwe di nava xwe de hilgirtiye, eger ziman nasnama netewekî be, pêwîste ew netew bibe xerîkê zimanê xwe, hemî hêz û şiyanên xwe ji bo rêncberiya wî re terxan bike, û em ji keç û lawên gelê xwe re dibêjin : gelî xoşewîstan, zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin da cîhan bizanê kû miletek ser rûê zemînê heye, navê wî Kurd e.

Çalakiyên Herêma Cezîrê

*** -**Bi boneya salvegra rojanamegeriya kurdî , komîta çandî ya rêxistna herêma rojavayî qamişlo, bi çalakên gewre rabû. Çar sêmînerên çandî , li dar xistin .

1- Di **6/4** an de, Dr Farûq Ebas , şevbuhêrka me ronî kir. Mijar li ser dîroka gelê herêmê ji 2900-2550 berî zayînê û xalin girîng têde rawestiya .

2- Di **13 / 4** an de, sîmînera duyemîn mamoste Azad Alî nivîskar , lêkolînvan û berpirsê kovara EL-hîwar. Wî li ser kurd û îslamiya konevanî , bi nêrînekê li ser rewşa kurdî ya awarte û sedemên ev rewş çêkirine û xwest têkiliya di navbera îslam û rewşa konevanî ya kurd di dîrokê de dest pê kir .

3- Sêmînara seyemîn **20 / 4** mamoste Îbrahîm alyûsif , helbest û rojnamevan, li gel mamoste Hewas Mehmûd , nîvîskar û lêkolînvan e. Wan bi hevdu re sêmînar , li dar xistin . Mamoste Hewas , li ser ragihandina kurdî dest pê kir. Di pê re mamoste Îbrahîm fêrdana xwe, li ser ragihandina Sûrî û rewşa wê şrovekir

4- Sêmînara dawî **27 / 4** mamoste Konê reş mêvanê wê bû, bîna kurdistana azad jê dihat , ji ber ku nû ji seredana wê hatibû . Şevbuhêrkê li ser rojên dawî , yê mîr celadet bû , danerê (A- B)ê ya kurdî latînî bû .

Mixabin ev sêmînar tev, di cejna ronamegeriya kurdî de bi zimanê Arabî bû , ji bilî ya mamoste Kon bi zimanê me yê şêrîn kurdî bû .

Cejna çarşema Sor û rojnamevanên kurd pîroz be